Australian Human Rights Commission
*everyone, everywhere, everyday*

# Gilîkirin

Encûmena Australî ya Mafên Mirovan dezgeheke serbixwe ye, ku derheqê gilîkirinên (şikayetên) xwe bi seksa bêqayilî (ta'deyên cinsî), neheqiyên bo sedemên nijadî, bo seqetiyê û temenê (u'mrê) kesan, neheqiyên bi kar û karkirinê ve girêdayî *(ILO III)* û ta'dekirina li mafên mirovan lêdikole û çareser dike.

## Derheqê çi de dikarî li nik me gilî bikî

- ***Neheqiyên cinsî (seksî)*** zordestiya cinsî (zêdegaviya seksî) û nehqiya li ser bingeha cinsî, nasnameya cinsî, nêrbûn/mêbûna mirovî, ducaniyê, haletên zewacê yan tevjiyana bêzewac, zaromêjandinê, berpirsiyariyên malbatî û meraqa cinsî (meyla seksî) dixe nav xwe.
- ***Neheqiyên bo seqetiyê*** cudalêniherîna (neheqiya) li ser bingehên kêmasiyên giyanî (a'ciziya bedenî), rewşenî *(intellectual)* û hewasî, yan bêqudretiya fêrbûnê û têgihîştinê *(learning and psychiatric disabilities)* dixe nav xwe, her weha neheqiyên bo nexweşiyê, nexweşiyên dirêjdemî, rewşa tenduristî, seqetiyên/birînên bi kar ve girêdayî, seqetiyên demên par, nuha û siberojê; û neheqiyên ji bo bikarhanîna alîkariyên giyanî, lawirên (heywanên) alîgir yan peywendiya bi kesekî xwedîseqetî re.
- ***Neheqiyên bo sedemên nijadî*** kîn û neheqiyên li ser bingeha nijad, reng, selalet, paşereha neteweyî yan etnîkî û yên bo koçberîya kesan dixe nav xwe.
- ***Neheqiyên bo temenê (u'mrê) kesan*** neheqiyên bi sedema ku kesek pirr (ziyade) ciwan e yan pirr temenmezin e dixe nav xwe.
- ***Neheqiyên 'ILO III'*** neheqiyên li şûna kar bo sedemên olî, dîroka cînayetî *(criminal record)*, çalakiyên sendîgehî, baweriya siyasî û paşreha civatî dixe nav xwe.
- ***Mafên Mirovan*** kiryarên ji aliyê hukûmeta federal *(Commonwealth)* yan li ser navê wê dixe nac xwe, ku dihêt gotin hinekan ji bendên navneteweyî yên mafên mirovan binpê dikin, wek bendên Peymana Navneteweyî ya bo Mafên Medenî û Siyasî, Peymana bo Mafên Zarokan û Peymana Mafên Kesên Xwedî Seqetî.

Li Australya dikarî li her şûna tu lê yî gilî bikî û gilîkirin (şikayet) bêpere ye. Gavên di proseya gilîkirinê de li jêr in.

## Bipirse

- Ger derheqê gilîkirina bo mijarekê de bi guman î, telefone Xizmeta Agahdarkirinê ya Encûmenê bike, *the Commission's National Information Service* li ser vê jimarê **1300 656 419** yan bi email bipirse: infoservice@humanrights.gov.au

April 2020

- Em dikarin forma gilîkirinê ji te re rêbikin bo destpêkirina proseya gilîkirinê.
- Ger em nikaribin alîkariya te bikin, em ê şûneke ku dikare raber bikin.

## Destpêkirina gilîkirinê

- Gilîkirin divêt nivîskî be. Dikarî forma gilîkirinê dagirî û bi postayê yan bi faksê li me vegerînî. Dikarî her weha gilîkirina xwe bi rêya înternêt bikî, di malpera me de: www.humanrights.gov.au.
- Dikarî bi zimanê dixwazî gilî bikî û ger pêdivî hebû em dikarin derheqê nivîsandina gilîkirinê de bi te re alîgir bin.
- Bo gilîkirinê pêdiviya bi parêzger (abûqat) niye.
- Ger me kêşe bi gilîkirina te re hebin, em ê şîrove bikin çima.

## Lêkolîn

- Em ê derheqê gilîkirina te de peywendiyê bi te re deynin û heye ku em bêtir agahdarî bixwazin.
- Pirraniya caran Encûmen peywendiyê bi kesê yan rêxistina tu li wan gilî dikiye (nerazemendiya xwe ji wan radigihînîye) re datîne û kopiyeke gilîkirina te dide wan. Heye ku em agahiyên taybet yan bersîveke derheqê gilîkirinê de ji wan bixwazin. Agahiyên derheqê gilîkirina te de bo Encûmenê bihên dayîn heye ku di nav de agahiyên şexsî, yên hesas jî, derheqê te de hebin.
- Hin caran heye ku em biryara ne-domandina proseya gilîkirina te bigirin. Ger weha bibe, em ê şîrove bikin.
- Heye ku em bi te re biaxafin derheqê hewldana çareserkirina kêşeya di gilîkirinê de bi rêya lihevkirinê (lihevhatinê, sulhê).

## Lihevhanîn (Lihevkirin)

- Lihevhanîn wê wateyê dide ku em bo dîtina rêyeke çareserkirina mijara tu bo wê gilî dikiye bi te û kesê/rêxistina tu li wan gilî dikiye re alîgir bin.
- Lihevkirin dikare rû bi rû be, di kombûneke wek ‘konferensa lihevkirinê’ dihêt binavkirin de, yan bi rêya konferenseke telefonî. Hin caran gilîkirin (nerazemendî) dikare bi rêya emailan û axaftina bi kesê bo lihevhanînê rolgir re bihêt çareserkrin.
- Lihevkirin dikare bi gellek şêweyên cuda encaman bide. Bo nimûne, bi daxwaza bexşandinê (lêborînê), bi guhertina bendekê yan rêyekê *(policy),* yan bi rêya dayîna berdêlekê *(compensation).*

## Îmkana cîhgirtina proseyeke dadî – neheqiyên bo sedemên cinsî (seksî), seqetiyê, nijadê û temen (u’mir)

- Encûman ne xwediya wê hêzê ye ku biryarê bigire ger neheqiyeke ne qanûnî cîh girtiye.
- Ger mijara gilîkirina te nehêt çareserkirin yan bo hinek sedeman nehêt domandin, heye ku bikaribî mijarê rakî pêş dadgehê. Dadgeh dikare biryarê bigire ger neheqiyeke ne qanûnî cîh girtiye.
- Divêt di nav 60 rojan de, li dû ku Encûmen proseya gilîkirina te radiwestîne, mijarê rabikî pêş dadgeha bi navê *the Federal Circuit Court of Australia* yan dadgeha *the Federal Court of Australia*.
- Encûmen nikare mijarê bo te rake pêş dadgehê yan dema niherîna dadgehê li gilîkirina te bi te re alîgir be.
- Heye ku pêdiviya te bi axaftina ligel parêzgerekî yan xizmeteke qanûnî hebe ger bixwazî biçî dadgehê.

## Biryar/Raport – neheqiyên kar û karkirinê ligor bendên *ILO III* û Mafên Mirovan

- Ger mijara gilîkirinê nehêt çareserkirin yan bo hinek sedeman nehêt domandin, heye ku Serdarê Encûmenê biryarê bigire ka neheqîkirina ligor bendên *ILO III* yan binpêkirina mafên mirovan cîh girtiye.
- Ger Serdarê encûmenê bawer be neheqîkirinê yan binpêkirina mafên mirovan cîh girtiye, heye ku Serdar mijarê derbas Parêzgerê-Giştî yê Federal, *Federal Attorney-General*, bike. Di raportê de Serdar dikare pêşniyaz bike ku berdêlek *(compensation)* jibo wendakirinekê yan ziyangihîştineke giyanî bo kesê ziyan lê bûye bihêt dayîn. Heye ku raport derbas parlemanê bibe.
- Nimûneyên biryargirtinên Serdêr derheqê neheqîkirinê û mafên mirovan de di malpera Encûmenê de ne, li vir: http://www.humanrights.gov.au/publications/reports-minister-under-ahrc-act.

## Dikarim ji ku bêtir agahdarî bi dest xim?

Agahiyên bo peywendîgirêdana bi Encûmena Australî ya Mafên Mirovan re:

**Telefon**
Xizmeta Neteweyî bo Agahdarkirinê: 1300 656 419
TTY (telefona bo peywendîgirêdana bi nivîs): 1800 620 241 (bêpere ye)
NRS (jimara xeta peywendî-girêdanê) 133 677
Faks: (02) 9284 9611

Ger te wergêr divêt telefone **131 450** bike û girêdana bi Encûmena Australî ya Mafên Mirovan re bixwaze.

Ger kerr bî yan kêşeyên bihîstinê bi te re hebin bi rêya TTY (telefona bo peywendîgirêdana bi nivîs) peywendiyê bi me re deyne, li ser vê jimarê 1800 620 241. Ger kerr bî yan kêşeyên bihîstinê yan axaftinê bi te re hebin dikarî her weha bi rêya xeta tevgirêdanê, *National Relay Service (NRS),* peywendiyê bi me re deynî: 133 677. Ger wergêrekî Auslan (wergêrên bo kerran) bo te divêt, em dikarin tevdêrê bo wê bikin (organîze bikin).

Ger kor (kûr) bî yan kêşeyên dîtinê bi te re hene, em dikarin agahiyan bi awayekî din bidin, ger bixwazî.

**Posta**

GPO Box 5218
Sydney NSW 2001

**Înternêt**
Email: infoservice@humanrights.gov.au
Malper: www.humanrights.gov.au

Dikarî bi rêya înternêt gilî bikî, ji vir:
http://www.humanrights.gov.au/complaints/lodging-your-complaint.

## *Şîreta (pêşniyaziya) qanûnî ya gelemper*

Ger tevdêra gilîkirinekê dikiye, heye ku bixwazî şîretên qanûnî bi dest xî. Xizmetên şîretên qanûnî bo civatê *(community legal services)* hene ku dikarin bêpere şîretan derheqê neheqiyan û tengasiyên ji kesan de bidin.

Dikarî peywendiyê bi Navendeke Alîkirina Qanûnî re, *Legal Aid body,* deynî (https://www.nationallegalaid.org/for-individuals/) yan bi nêziktirîn Navenda Xizmetên Qanûnî bo Civatê re (www.naclc.org.au/directory).

**Ne-berpirsî: Agahiyên di vê rastî-rûpelê de tenê bi armanca rêberîkirinê ne. Ne berdêlên şîretên qanûnî ne.**